

**Ji bo dêûbavên, zarokên
wan diçin kreşên Berlinê**

04.03.2021

**Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser vekirina hêlînan a di xebata asayî ya
berbisînorkirî de ya piştî 9ê Adara 2021an**

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

Her çiqas di dema dawî de ji nîvî bêhtirê tevahiya zarokan dikaribûn ji lînêrîna zarokan a acîl sûdê bigirin, dîsa jî girtina hêlînên zarokan ên Berlinê ya ji 25ê Çileyê 2021an ve ji bo we û zarokên we zehmetî û astengiyên gelek mezin di jiyana rojane de pêk anî. Haya Senatoyê ji vê zehmetiya malbatan heye.

Bi vê zanîne û li ser vê bingeha pêkhatinên enfeksiyonê yên gelekî kêr, ku li hêlînên zarokan ên danê rojê yên li Berlinê rû didin, Senatoyê lewma di civîna xwe ya 02.03.2021an de biryar stand, ku xizmetên piştgiriya zarokan a danê rojê (hêlînên zarokan û lînêrîna zarokan a danê rojê) **piştî 09.03.2021an dîsa ji bo tevahiya zarokên li Berlinê veke û destûrê bide xebateke asayî ya berbisînorkirî, ku li gorî şertên pandemiye dimeşe.**

Bi berfirehî wisa tê plankirin:

1. Divê tevahiya zarokan bikaribin sûdê ji xizmeteke piştgiriya zarokan a danê rojê bigirin. Berbisînorkirina xizmetê ya tenê ji bo komên armanckirî betal dibe. Êdî pêdivî bi bikaranîna lîsteya pîşeyên bi sîstemê ve girêdayî namîne.
2. Xizmeta lînêrînê ji bo tevahiya zarokan tê pêşkêşkirin, ku mafê hiqûqî ye, ku rojê herî kêr ji 7 saetan pêk tê û rewşa kar li ber çavan nayê girtin.
3. Divê hêlînên zarokan, bi qasî ku ji destê wan tê, çarçoweyeke lînêrînê ya li gorî pêdiviyê pêşkêşî malbatan bikin û ji ber vê yekê jî herî kêr komeke bi demdirêjîya lînêrîna rojane ya li gorî kupona ji bo lînêrîna tevahiya rojê pêşkêşî bikin.
4. Ji bo pêşgirtina li enfeksiyonê, divê têkilî werin kêmkirin û derfeta şopandina wan were afirandin. Ji ber vê yekê divê lînêrîna zarokan, bi qasî ku pêkan e, di komên sabît de pêk were.
5. Divê tedbîrên paqijiyê yêr heyî, wekî berê werin bicîanîn.

Vekirina hêlînan a di dema pêş de dê ji bo sazî û navendan zahmetiyên mezin ên rêxistinî pêk bîne, bi taybet di rewşên wisa de, ku ne tevahiya perwerdekarên dikarin herin ser kar. Heger ev yek li hêlîna we ya zarokan jî wisa be, di rewşên taybet de bi riya axaftina li gel çavdêriya hêlînên zarokan pêkan e, ku ji bo demeke berbisînorkirî modelên lînêrînê yêr bi awayê guherîna rojane yan jî heftane werin pêşkêşkirin. Di derbarê vê mijarê de em ji we rica dikin, ku hûn hêj ji niha ve xweşbîn nêzîkî hêlînên zarokan bibin û piştgiriya bidin wan.

Ji bo vê yekê em ji we rica dikin, ku bi berdewamî teqez bi qasî ku pêwîst e, hûn ewqas sûdê ji xizmeta lînêrînê bigirin û di derbarê vê mijarê de bi rêkûpêk li gel hêlîna xwe biaxivin.

Vekirina xizmetên piştgiriya zarokan a danê rojê dê bi riya pêşkêşkirina berfireh û domdar a testên zû ya ji bo xebatkarên hêlînan û her wisa bi riya pêşkêşkirina materyalên parastinê (bi taybet Parastina-Dev-Pozî / FFP 2) bihevgerêdayî bimeşe. Berfirehkirina stratejiya derzîlêxistinê jî li vê yekê zêde dibe, ku xebatkarên hêlînên zarokan di dora pêşengiya derzîlêxistinê de derketine pêş û di demeke nêz de dikarin derzî li xwe bidin.

Ev tedbîr dê ji bo ewlehî û hevsengiya xebata lînêrînê ya li hêlînên zarokan û ya li lînêrîna zarokan a danê rojê bibin alîkariyên girîng.

Bi destpêkirina xebata asayî ya berbisînorkirî, Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan ji bo tevahiya malbatan piştî Adara 2021an bi gelemperî mecbûrî dibîne, ku parçeyek ji heqê mesrefên lînêrînê bidin, ku mehê bi qasî 23 Euroyan e. Her çiqas zarokên we neçin hêlînê jî, ev yek ji bo we jî derbas dibe.

Ev yek ji niha û pê ve jî wisa dimîne, ku em ê her wisa piştî destpêkirina xebata asayî ya berbisînorkirî ya li gorî şertên pandemiyê, bi baldariyeke mezin pêkhatinên enfeksiyonê yê li navendan bişopînin û binirxînin, da ku gava pêdivî çêbû, em bikevin nav tevgerê.

Ji bo pirsên we, xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan hêjê hete 15.03.2021an bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji 9an hete 15an xwe bigihîninê.

Ji bo piştgiriya we ya di warê derbaskirina vê rewşa niha de em gelek spasdarên we ne. Em hêvî dikin, ku ev rêbazên nû rêxistinkirina jiyana we ya malbatî hêsan bikin û hinek normalî bixin nav jiyana rojane ya zarokên we.

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya V

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk